



Zanyariyên bingehîn li ser lêdana vaksîna koronavîrûsê

Em pêşniyar dikin ku hûn vaksînê lê bidin ku xwe û malbata xwe biparêzin!

Hûn li ku derê têne vaksînkirin?



Hûn di xaniyê LAF de dijîn
Bijîşk dê were xaniyê û kesên ku li wir in vaksîn bike.
Vaksîna ku tê bikar anîn "BioNTech" e.

Vaksînlêdan bi dilxwazî ye.



Hûn dikarin biryar bidin:
ez dixwazim vaksîn lê bidim? an na?

Vaksînlêdan belaş e.



Hûn ne hewce ne ku ji bo vaksînlêdanê pere bidin.



Zarok û ciwanên heta 15 salî.



Jinên ducanî.



Her kesê ku bi tayê ye.
Her kesê ku alerjiya vaksînê heye.
Alerjî wate hûn nikarin tiştêk tehemul bikin.



Heke hûn berê tûşî koronavîrûsê bûne.
Di wê rewşê de, hûn hîn jî parastî ne û tenê hewce ye ku paşê 1 dozêk vaksînê lêdin.
Doktor dê bibêje ku hûn ê kengî dozêk vaksîn lê bidin.

Kî divê neyê vaksînkirin?

Naveroka vê belavoka LAFê li ser bingeha wan zanyariyane ku Enstîtuya Robert Koch (RKI) a Berlîn bi hevkarîya Charité –Universitätsmedizin Berlin, klînîka tenduristiya cinsî ya Friedrichshain-Kreuzberg, Navenda Plansaziya Malbatê Berlin e.V. - BALANANCE û Nivîsgeha Koordînasyona Birêvebiriya Penaberan a Beşa Senatoyê ya ji bo Entegrasyon, Kar û Karûbarên Civakî belav kiriye.



Zanyariyên bingehîn li ser lêdana vaksîna koronavîrûsê

Berî ku hûn vaksîn lê bidin, ji kerema xwe ji doktor re vebêjin:



- Heke hûn berê tûşî koronavîrûsê bûne.
- heke hûn qet li cem doktorê hest bi nexweşîne kirine.



- heke hûn qet di encama derzîledanekê de ji hiş çûbin,
- heke we li hember vaksînek bertekê neyînî hebûye,



- heke we di 2 hefteyên dawî de vaksînek din lê dane,



- heke alerjiya we heye.
Alerjî wate hûn nikarin tiştek tehemul bikin.

Piştî vaksînlêdanê:



Gelek kes vaksîne baş tehmûl dikan.
Vaksînlêdan riya vegeerîn ji bo jiyana normal e.
Mînakî: serdan, korsên ziman, dibistan an kar.
Bêyî ku testê bidin, hûn dikarin dîsa biçin kirîne.



Hin kes piştî vaksînlêdanê bandorên sivik hîs dikan.
Ew êşê dikişînin.
An jî halê wan ne baş e.
Bandor divê demek dirêj dom nekin.



Piştî vaksînlêdanê hûn êşê dikişînin?
Piştî vaksînlêdanê halê we nebaş e?
Ji karmendên xaniyê re bibêjin.



Karmend dê ji doktorek bipirsin.
Doktor dê ji we re bibêje ka hûn çi bikin.